Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1000 28-Îlon- 2022 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com 423165

‘Dixwazin gel û xwezayê ji hev qut bikin’

Hevseroka HDP’ê ya Şirnexê Sabuha Akdag: “Bi salane xwezaya Kurdistanê tê talan kirin, di van salê dawî de êrişên li ser xwezaya Kurdistanê zêdetir bûne. Bi taybetî ji zozanê herêma Botan tên aramanc kirin. Bi vê jî dixwazin gel û xwezaya Kurdistanê ji hev qut bikin û van herêman bê gel bihêlin.”

Ji bo xwedî derketin û parastina xwezaya Kurdistanê gelê Kurd û xwezaparêzên Tirkiyê li Şirnexê kombûn û ber bi çiyayê Cûdî ve meşiyan. Têkildarî çalakiya hatî lidarxistin, Hevseroka HDP’ê ya Şirnexê Sabuha Akdag ji rojnameya me re Rojev Mexmûrê re axivî û got: “Heta ku talankirina xwezayê neyê rawestandin emê di nava çalakiyan de bin û emê berxwedanê bilintir bikin. Pêwîste em bi yek dengî li dijî van êrişan dengê xwe bilind bikin û ji talankirina Kurdistanê re bibêjin Na.”

‘Tevî hemû qedexeyan jî me çalakiya xwe kir’

Sabuha Akdag îşaret bi êrişên li ser xwezaya Kurdistanê kir û balkişand li ser helwesta gelê Kurd ya li hemberî van êrişan û got: “Bi salane xwezaya Kurdistanê tê talankirin, di van salê dawî de êrişên li ser xwezaya Kurdistanê zêdetir bûne. Bi taybetî ji zozanê herêma Botan tên aramanc kirin. Bi vê jî dixwazin gel û xwezaya Kurdistanê ji hev qut bikin û van herêman bê mirov bihêlin. Destpêkê ev herêm di şewitandin, dema dîtin

piştî şewatê carek din şîn dibin, vê carê serî li rêyên birîna daran dane ku bi gişti xwezaya Kurdistanê tine bikin. Di nava van du salan de me gelek çalakiyên cûr be cûr lidarxistin, lê çalakiyên me ji aliyê desthildaran ve dihatin asteng kirin. Dema me biryara çalakiya ber bi çiyayê Cûdî ve dayî jî, ji aliyê walîtiya Şirnexê ve ji bo 12 rojan qedexeya ketina Şirnexê hat ragihandin. Lê li ruxmê van qedexeyan jî me karî em çalalkiya xwe bi girseyek mezin lidarbixin. Polîsan gelek astengî xistin pêşiya me, lê nekarîn me bidin rawestandin. Çalakiyek pir biwate bû, ji ber ku ji hemû herêmên Kurdistanê hatibûn û xwezaparêzên Tirkiyê jî cihê xwe tê de girtibûn. Xwedîderketina li çalakiyê hêz da me ku em çalakiy xwe xurtir bikin.”

‘Teqez serkeftin ya gelê Kurd e’

Hevseroka HDP’ê ya Şirnexê Sabuha Akdag di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku polîsan ji bo vala derxistina çalakiyê gelek hewildan kir, lê biryardariya wan ya xurt polîs vala derxistin û wiha peyîvî: “Beriya ku em dest bi meşê bikin, ji aliyê polîsan ve bi ava germ û gaza rondikrêj êrişî meşa me kirin. Lê ji ber helwesta me ya yek dengî, neçar man ku pêşî li çalakiya me vekin. Heta ku talankirina xwezayê neyê rawestandin, emê di nava çalakiyan de bin û emê berxwedanê bilintir bikin. Pêwîste em bi yek dengî li dijî van êrişan dengê xwe bilind bikin û ji talankirina Kurdistanê re bêjin Na. Nîjatperestiya heyî li ser hemû heyîn û hebûnên li Kurdistanê didin pêkanîn. Bi van êrişan dixwazin Kurdan tine bikin. Lê wê ti caran negihijin armanca xwe, ji ber ku hêza me ya têkoşînê ji ya wan gelek mezintire. Emê heta dawî li berxwebidin. Em bang li tevahî gelê xwe dikin ku li hember van êrişan bibin xwedî helwest. Em di wê baweriyê de ne ku wê dawî li desthilatdarî û nîjatperestiya heyî bêt, teqez serkeftin ya gelê Kurde.”

-*ROJNEWS*

Bi wêneyan çilekiya pisîkan

Hesabekî bi navê “Cats of Yore” yê twitterê ji bo balê bikêşe ser nehsbûna pisîkan ji dîroka hunerê wêneyên şêwekaran yên kevn, parve dike û dibêje, dizî, çilekî û nehsbûna pisîkan tenê ne di serdema me ya roja îro de, her wiha di demên bihurî de ango berê jî bi û nav û deng bûye.

Dizî û çilekiya pisîkan ji mêj ve ye tê zanîn. Nexasim jî wexta ku şîva malê goşt yan jî masî be, wê şevê daweta wan e. Hin caran beriya ku şîv biqede, te dît, wan xwe avet ser sifreyê û çi kete ber wan, dizîn, ev carna dibe ku çend hestî û carna jî dibe ku dasiyên masîyan bin. Yanî hin pisîkên çilek, xwe nagirin, îdare nakin û nikarin xwe li benda dawiya şîvê bigirin û hestiyên mayî bikojin!

Hesabekî bi navê “Cats of Yore” yê twitterê, ji bo balê bikêşe ser nehsbûna pisîkan ji dîroka hunerê wêneyên şêwekaran yên kevn parve dike û dibêje, dizî, çilekî û nehsbûna pisîkan tenê ne di serdema me ya roja îro de, her wiha di demên bihurî de ango berê jî bi û nav û deng bûye. Ji lewma jî ew weke mijarekê gelek caran hatiye xêz kirin. Cats of Yore, ji bo em vê yekê bibînin berê me dide dîroka şêwekariyê.

Di tabloyên ‘naturmort’ de pisîkên nehs

Hesabê “Cats of Yore” ji hêla Molly Hodgdon ve hatiye avakirin. Wê li ser hesabê xwe tenê wêneyên derbarê pisîkan de parve kirine. Di van wêneyan de dizî û çilekiya pisîkan nîşan dide. Weke çavkanî jî tabloyên şêwekaran nîşanî xelkê dide. Di tweeta xwe ya ewilî de gotiye, “Di hin tabloyên naturmort de pisîkên ku xwarinê didizin hene. Yek ji jêrecûreyên hunerî yên ku jê hez dikim jî ev e. Ew bi vê nehsbûna xwe li hember dîroka hunerî radibin û dema birçî bin, xwe di nav her rîsk û tehlûkeyê werdidin, her tiştî didin ber çavên xwe. Meriv di van tobloyan de vê yeke baştir dibîne.”

Dizî û çilekiya pisîkan ne ya van rojan e

Cats of Yore hin tabloyên ku di sedsala 17 û 18’an de hatine çêkirin, parve kirine. Ev tablo wan kêliyên dizî û çilekiya pisîkan pirr

baş nîşan didin û şirove dikin. Di hin wêneyan de çavên wan li ser masiyên li ser sifrê ye, di hinan de jî ew li bendê ne ku keysa xwe lê xweş bikin da ku xwarinên li ser sifrê bidizin û bixwin.

Ev wêneyên ku li ser dizî û çilekiya pisîkan hûr bûne, derbarê pisîkan de vê yekê nîşan didin ku ew ji mêj ve bi dizî û çilekiya xwe navdar bûne.

Wêneyên ´naturmort´ yên Alexandre-Franois Desportes (1705), Jean Baptiste Simeon Chardin (1728), Sebastiano Lazzari (1760), Giovanî Rivalta (1780) û Alexander Adriaenssssen (1631) hin ji wan wêneyan in ku bi dizî û çilekiya pisîkan daketine û ew pisîk di ser diziyê de zeft kirine. Rûpela “Cats of Yore” gelek ji van wêneyan parve kirine û dixwaze bala xelkê bikişîne ser vê xislêta pisîkan û jiyana wan.-*Ozgurpolitika*

Sudoku:Pirs 10

			4	1	8		3	
				6				
1		2		7			5	
5	8						6	1
	9		3	4	1		8	
3	1						4	2
	2			3		8		9
				5				
	3		1	9	7			

Sudoku: Bersiv 9

5	6	2	3	7	1	9	4	8
3	8	9	4	5	6	7	1	2
4	7	1	8	2	9	6	5	3
7	2	5	1	9	3	4	8	6
1	4	3	7	6	8	2	9	5
8	9	6	2	4	5	3	7	1
6	1	8	9	3	4	5	2	7
9	5	7	6	8	2	1	3	4
2	3	4	5	1	7	8	6	9

Di çalakiyên gerîlayan de 8 leşkerên Tirk hatin cezakirin

HPG’ê ragehand ku di çalakiyên gerîlayên azadiyê yên Kurdistanê de 8 leşkerên Tirk ên dagirker hatin cezakirin û got, ji ber ku dagirkeran li hemberî gerîla bêçare mane, 16 caran bi bombeyên qedexekirî û çekên kîmyewî êriş kirin.*R-3*

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1000 28-Îlon- 2022 www.ronahi.net/ku/

Hikûmeta Paşînyan li hemberî Kurd û Ermenan xiyanetê dike

Radestkirina 2 gerîlayên HPG,ê bi destê hikûmeta Paşînyan ji dewleta Tirk a dagirker re, li têkoşîna gelên Kurd û Ermen xiyaneteke mezin e. R-4

Rêveberiya Avê ya Qamişlo: Emê hê zêdetir bal bikşînin ser paqijiya avê

Rêveberê Rêveberiya Avê ya Kantona Qamişlo Xorşîd Oso da zanîn ku ava diçe ji welatiyan re rojane tê taqîmkirin û got, emê hewl bidin ku aveke paqij û dirust ji tevayiya tax û gundewarên Qamişlo re peyda bikin. ***R-6***

Pêşangeha Saziya Êzîdîna...çavkaniya zanîna ola Êzîdatiyê ye

Bi armanca naskirina ola civaka Êzîdî û cewhrê wê, Saziya Êzîdîna bi navê `Cihek ji bo naskirina Êzidiyan` pêşanghek pirtûk û wêneyan li dar xist.***R-7***

’Jina Kurd li Rojhilatê Kurdistanê bû çirûska şoreşê’

Berdevka Yekîtiya Jinên Ermen yên bakur û rojhilatê Sûriyê diyar kir ku jina Kurd li Rojhilatê Kurdistanê mînaka jina berxwedêre û got, tevî zext û şidetê jî, jina Kurd li Rojhilatê Kurdistanê bûye pêşenga serhildanê. ***R-5***

`Şoreş bi keziyê Jîna dest pê kir û wê bi azadiya jinê bidawî bibe`



Rojnemavan Solîn Mihemd Emîn diyar kir ku ti kes nikare li hemberî vîna jinê bisekine û got, bi tolhildana Jîna Emînî wê jin azadiya xwe bi dest bixe. ***R-2***

DILYAR CIZÎRÎ
JIN JIYANA AZADÎ...
R-4

Memed Serdar
Ji bo dagirkeran her tim ...
R-5

Zekî Bedran
Divê ciwan li Şoreşê xwedî ...
R-5

`Şoreş bi keziyê Jîna dest pê kir û wê bi azadiya jinê bidawî bibe`

Rojnemavan Solîn Mihemd Emîn diyar kir ku ti kes nikare li hemberî vîna jinê bisekine û got, bi tolhildana Jîna Emînî wê jin azadiya xwe bi desť bixe.

Dilîn Ehmed-Qamişlo

Çalakiyên şermezarkirina bûyera kuştina Jîna Emînî, keça Kurd ya 22 salî, li seranserê cîhanê rojbiroj firehtir dibin û nerazîbûn û pêşandan zêdetir dibin. Çalakvanan li dijî kuştina Jîna Emînî ku ji aliyê Polîsên Exlaqî yên Îranê ve hat kuştin, di çalakiyên xwe de wêneyên Jîna Emînî, bi dirûşmeya "Jin, Jiyan, Azadî" radikin , herwiha şerpeyan dişwitînin û porê xwe jî qut diki. Jinên her çar perçeyên Kurdistanê jî bi çalakiyên cuda nerazîbûna xwe ya li dijî kuştina Jîna Emînî, diyar dikin. Jinên Rojava jî bi şewtandina şerpeyan û qutkirina porên xwe, tevlî xwepêşandên ji bo piştgiriya bi jinên Rojhilat re, dibin.

Rojnamevan Solîn Mihmed Emîn jî, yek ji wan jinên ku bi qutkirina porê xwe, nerazîbûna xwe ya li dijî kuştina Jîna Emînî, nîşan da. Têkildarê mijarê Solîn Mihemed ji rojnameya me re axivî û diyar kir ku, divê tevayîya jinan tevlî xwepêşandana şeremezarkirina kuştina Jîna bibin û nerazîbûna xwe diyar bikin.

`Rejima Îranê û DAIŞ du rû bi mejiyekî ne`

Solîn Mihemd Emîn diyar kir bêheqiya rêjîma Îranê ya li dijuî jinan tevayiya sînoran derbas kiriye û wiha got: "Ji destpêka hatina Xumeynî ser desthilata Îranê û destpêkirina şoreşa bi navê Îslamê û heta roja îro, rejîma Îranê zimê li jinan dike. Ti biryar û zagonên wê yên ku mafê mirovan bi giştî biparze nîne, bi taybetî yên mafê jinê. Biryarên wê yên li dijî jinan pir bêheqî, zalim û zorin. Tiştê ku îro li Îran û Rojhilatê Kurdistan diqewim e, vê yekê piştrast dike."

Solîn diyar kir ku, rejima Îran her tim xwe ji cîhanê re dide diyar kirin ku ew rejimeke aşîtîxweze û got ku, ji bo rejima Îranê zilm û binpêkirinên derheqê gel de veşîre, di bi navê ola Îsalmê bang dike.

`Şoreşa bi pêşengiya jinê dest pê bike bê guman wê bi ser keve`

Solîn da xuyakirin ku her kes baş dizane ku Şoreşa bi pêşengiya jinê dest pê bike, bê guman wê bi serkeve û dirêjî da axaftina xwe: "Rejima Îran ji hêza jinê pir ditirse, lewra di heqê jinan de biyarên herî xirab ferz dikin. Îran di wê baweriyê de ye ku, şorşa bi pêşengiya jinê dest pê bike wê bi ser keve û wê hebûna rejima Îranê pûç bike. Ji bo wê weke em dibînin ku rejima Îranê li dijî xwepêşandanên gel, hemû rêbazê tundî û qirkirinê pêk tîne. Ew dizane ku Şoreşa ku bi keziyên Jîna Emînî dest pê kir, wê bi azadiya jinên Rojhilat bi dawî bibe. Lewra ev serhildanên li Îran û rojhilatê Kurdistanê wê guhertineke pir mezin bi xwe re bîne."

Solîn da zanîn ku ji ber tirsa rejima Îranê ji hêza jinê, polîsîn bi navê exlq ji xwe re çêkiriye û axaftina xwe wiha dewam kir: "Tiştê ku rejima Îranê di heqê gel de dike bi taybtî di heqê jinê de, ji fikrê çteyên DAIŞ`ê ne cuda ye. Çeteyên DAIŞ`ê jî bi navê Îslamê gelek biryar û zagonên dijî miroviyê û exlq li ser mirovan ferz dikirin."

Solîn Emîn wiha got; Tiştê ku li rojhilatê Kurdistanê çêdibe şoreşa jinê ye, lewra jin bi hemû hêza xwe ji bo tolhildana jina kurd Jîna Emîn, li hember rejima zalim serê xwe radike û şerpeya ku bi ferzkirinê li serê xwe dikirin, dişewitîne.

`Ji bo bidestxistina azadiyê li ber xwe bidin`

Solîn li ser qutkirina pora xwe, wiha got; "Li ku derê tundî li ser jinê were kirin, helbet li ser mine jî. Lewra beriya her tiştî ez jin im û jina kurdim, Jîna jî kurd bû. Em jinên kurd nikarin li hember zilmê bêdeng bimînin. Bi qutkirina pora xwe ya tişta herî buha di jiyana min de, tevlî vê pêşandanê bûm da ku em li dijî desthiladara, xwedî yek helwest bin. Nama min ji tevlîbûnê ewe ku ji jina re diyar bikim ku, derfetê nede ti kesî ku biryarê di heqê wê de bistînin. Lewra em xwediyê por, nerîn, cil û biryarên xwe ne."

Rojnamevan Solîn Mihemd Emîn li ser girîngiya rola ragihandinê di vê mijarê de gotina xwe bidawî kir û wiha got: "Bê guman di rewşên wiha de rola ragihandinê pir girîng û pêwîst e, bi taybetî rojnamevanên Kurd. Ez bi xwe dibîjim heta dawiyê ezê pêştevaniya van xwepêşandan bikim û bi taybatî ji bo pêşgiriya jinan ezê di riya kerê xwe de bibim dengê wan. Banga min ji bo tevayîya jinên cîhanê li dijî desthiladaran bisekinin, divê em bi hemû hêza û têkoşîn piştgiriya jinên rojhilatê Kurdistanê bikin. Ta ku em bi tkoşîn û berxwedana xwe azadiya xwe bidest bixin, lewra azadî layîqî me ye."

’Raperîna gelê Rojhilat û Îranê li dijî zordestiya li ser jinan e’

Şadiya Omer got ku gelê Kurdistanê nema mêtingeriyê qebûl dike, serhildana jinan a li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê dê mora xwe li dîrokê bixe.

Endama Rêveberiya Meclisa Jinan a Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) Şadiya Omer der barê jina Kurd Jîna Emînî ya 22 salî ku li Tehran a paytexta Îranê ji aliyê polîsên exlaq ên dewleta Îranê ve bi hovîtî hat binçavkirin û di encama îşkenceyê de hat qetilkirin, ji ajansa me re axivî.

Her tişt ji bo jinan hatiye qedexekirin!

Şadiya Omer got ku her tişt ji bo jinan hatiye qedexekirin û sînordarkirin û wiha dest bi axaftina xwe kir: "Mixabin heta roja îro di sedsala 21'ê de desthilatdarî li ser jinan ji aliyê dewletan ve tê meşandin û pê re nirxên civakê tên valakirin. Dewlet her dem di bin navê ol û kevneşopiyên civakê de qanûnan li gorî berjewendiyên xwe derdixe, mînaka wê ya herî ber bi çav bûyera ku li Îranê qewimî ye. Me dît çawa jina Kurd a bi navê Jîna Emînî ji ber xuyakirina hin biskên porê xwe bi rengekî hovane hat qetilkirin. Ev mijar tenê ji bo Îranê derbasdar nîn e lê belê li seranserê welatên cîhanê jin rastî cureyên qetilkirin û şîdetê tên. Di dirêjahiya dîrokê de û di hemû waran e her tişt ji bo jinan hatiye qedexekirin."

Raperîna gelê Rojhilatê Kurdistan û Îranê li dijî zordestiyê ye

Şadiya Omer diyar kir ku raperîn û serhildana gelê Rojhilatê Kurdistan û Îranê li dijî zoredestîyê ye û wiha berdewam kir: "Dewlet her dem îdia dikin ku ew welat in, pêşketî ne û bi navê demokrasiyê bang dikin lê belê tiştek wiha tune ye. Qetilkirina jineke Kurd ji ber ku biskek porê wê derketiye, zilm û zordariya dewleta Îranê diyar û teqez dike. Her wiha gelê wê gihîştiye astekê ku nema van kiryaran qebûl dike, şoreş ji bo vê yekê çêdibin da ku guhertin çêbibin. Li Îranê hemû cureyên neheqiyê hene ku dewlet ji wan re dibêje gere hûn siyasetê nekin û kesên ku siyasetê dikin jî tên binçavkirin. Dewlet dixwazin gel ker û lal bimînin lê belê gelê Kurdistanê nema sîstema dewletê qebûl dike."

"Dewlet ji rêxistinbûyîna jinan ditirsin"

Şadiya Omer bang li jinên cîhanê kir ku rêxistnbûyîna xwe xurt bikin li hemberî her cure şîdeta li ser jinan û wiha bi dawî kir: "Dewletên serdest her dem ji rêxistinbûyîn û hêza jinan ditirsin ji lewre pêwîst e tirsa me di dilê dijmin de bimîne, em ê ji bo azadî û rêxistinbûyîna xwe têbikoşin. Pêwîst e ku em qalikê zilma li ser xwe bidin şikandin. Banga me jî ji bo tevahî jinên cîhanê ew e ku divê em bikaribin yekitiya xwe xurt bikin li hemberî şîdet, tundî û kuştina jinan xwedî helwest û bersivên xurt bin."

JINHA

Pêşangeha Saziya Êzîdîna.. çavkaniya zanîna ola Êzîdatiyê ye

Bi armanca naskirina ola civaka Êzîdî û cewhrê wê, Saziya Êzîdîna bi navê `Cihek ji bo naskirina Êzidiyan` pêşanghek pirtûk û wêneyan li dar xiśt.

Bêrîtan Çiya - Qamişlo

Ji bo naskirina rastiya ola Êzîdayetiyê û derxisitina cewherê wê, Gulana 2020, li bajarê Qamişlo Saziya Êzîdîna, projeya Kulîlka Zeytûnê dest pê kir. Ev projeye gelek çalakiyan di nav xwe de dihewîn, mîna deyêna semîneran li ser baweriya civaka Êzîdî, nîqaşa bi xelkên derdorê re, çêkirina pirtûkan û herî dawî pêşangeha bi navê `Cihek ji bo naskirina Êzidiyan` ku ji 14` Îlonê dest pê kir û wê heta 29`ê dewam bike.

`Rastiya ola Êzdî nasbikin`

Têkildarê mijarê rêveberyê Şopandin û Nirxandinê ya Saziya Êzîdîna Wesîm Şemo ji me re axivî. Wesîm Şemo diyar kir ku ola Êzîdayetiyê ola ku herî rastî tundî û şaştêghiştinê hatiye û axaftina xwe wiha dweam kir: "Armanca me ji lidarxistina pêşangehê, sererastkirina fikrên şaş yê li ser ola Êzîdayetyê ye. Ola civaka Êzîdî ew ola ku ji aliyê desthilatdaran ve hatiye xerabkirin û ji aliyê gelan ve şaş hatiye fêmkirin. Ev jî bû sedem ku civaka Êzîd rastî gelek êriş û komkujiya were. Yek jî komkujiya ku çeteyên DAIŞ`ê di derheqê civaka Êzîdî de kir. Lewra me lidarxistina vê pêşangehê pêwîst û girîng dît."

Herwiha Wesîm da zanîn ku ew bi riya pêşkêşkirina pirtûkên pêşangehê ol, çand, jiyan û kevneşopên civaka xwe, bi awayekî berfirih par vedikin û wiha got; "Di pêşangehê de nêzî 120 pirtûkan hene, di hindirê wan de jiyana, ol, çand, kesayetên binavûdeng yê Êzdî û baweriya civaka Êzdî dihewîne û şîrove dike. Beşê pirtûka ya ku me herî zêde balkişand ser, çîrokên jinên ku ji komkujiya çeteyên DAIŞ`ê rizgar bûn. Herwiha peykerê olxana pîroz ya Laleş bi hûrgulî û girîngiya xwe jî, heye."

`Projeya lidarxistina pêşangeheke mestir heye`

Rêveberê Şopandin û Nirxandinê yê Saziya Êzîdîna Wesîm Şemo da zanîn ku ew dixwazin tevaiya cîhanê cewherî ola Êzîdayetiyê nas biki û axaftina wiha qedand: "Ev cara yekê ku li bajarê Qamişlo pêşangehek bi vî rengî tê li dar xistin, pêşangeh pir bi çûke, lê ew jî li gor derfetê me ye. Tenê em dixwazin gelên Rojava û tevayiya cîhanê rastiya ola Êzîdayetiyê nas bikin. Ta ku nerîna ne rast yên li ser vê olê ji mejiyê xwe derxênîn. Di ola civaka Êzîdiyan de jî aştî û xêrxwazî bingehê her tiştiye. Di demê pêş de projeyên me hene ku em pêşangehekê mezin li dar xin, ta ku em hîn bêtir ola Ezîdayetiyê bi civakê bidin naskirin. Hêviya me ewe ku, cîhan ola civaka Êzîd baş nasbikin û li gorî wê mafê me jî were parastin."

Hesreta xwe ya ji bo jiyana xwezayê, bi nîgarên rengîn dinexişîne

Khadra al-Sawarka ku hewl dide hesreta xwe ya ji bo jiyana xwezayê bi nexş û nîgaran der bike, jinên xurt ên wekî xwe perwerde dike.

Khadra al-Sawarka ya 80 salî ku li taxeke Beyt Lahya ya bakurê Şerîdaya Xazayê dijî, ji bo hesreta xwe ya jiyana çolê dabîn bike, ji mûyên bizinan kon, xalîçe û gelek berhemên ku motîfên rengîn in çêkir. Khadra El-Sawarka niha bi piştgiriya neviyên xwe û zarokên xwe, pêşangehek ku tê wateya maçkirina jiyana wê di jiyana bedewî de vekir. Khadra al-Sawarka, bi vegotina jiyana xwezayê dest bi axaftina xwe kir, wiha dibêje: "Ez pir bêriya jiyana xwezayê dikim. Jiyana me ya bêdeng hebû. Telefon tunebû, avahiyên betonî tunebûn, em ji qerebalixa bajêr dûr bûn. Li wir jiyana me aram bû, her kêliyê, em bi xwezayê re di nava hev de bûn."

"Em serê sibê zû şiyar dibûn"

Khadra El-Sawarka diyar dike ku li gund bi ajalan re eleqeder dibûn, bi van gotinan qala jiyana li gund û di nava xwezayê dike de: "Em serê sibê zû şiyar dibûn û karê me yê ewil hevîrkirina ard bû. Piştre me li ser sêlê nanê xwe dipêjand. Keçên ciwan li mêrg û zeviyên kesk pez diçêrandin. Keçên ciwan dema ku roj derdiket ajalan derdixistin û piştî nîvroyê şivanî bi dawî dibû. Ligel wan jî çenteyên ku xwarina xwe dixistin hebûn û dema diwestiyan û bêhna xwe didan xwarina xwe dixwarin."

"Me pêdiviyên xwe bi riya pêguherî bi cih dianîn"

Khadra El-Sawarka da zanîn ku li gund jiyana komînal hebû û wiha domand: "Me xwarinê parve dikir û ji bo bicihanîna pêdiviyên xwe me pêguherî dikir. Li vir tu girîngiya pere tunebû. Ji xeynî vê, em bi hiriya bi dest tê çêkirin re mijûl dibûn. Dema ku me ajalan diçêrand, di navbera xwe de me pêşbirk dikir ka em bibînin dê kî pêşiyê tevna di destên xwe de biqedîne... Me qadên kesk û şil tercîh dikir û dem bi dem, me cihê xwe diguherand."

"Çêrandina hêstiran hêsantir e"

Khadra al-Sawarka anî ziman ku ew hêstiran jî xwedî dikin û dide zanîn ku çirandina hêstiran ji pez pir hêsantir e. Khadra El-Sawarka wiha dibêje: "Ji ber ku hêstir fermanên xwediyên xwe baş fam dikin. Ji ber vê yekê mirov rêwîtiya bi hêstiran re tercîh dikin. Piştî ku em ji çêrandinê vegeriyan, me nanê sêlê amade dikir û piştre me di konên xwe yên ku ji hiriyê hatine çêkirin de, bêhna xwe vedida."

"Min pezê xwe jî anî bajêr"

Khadra El-Sawarka, diyar kir ku li gel zehmetiyên jiyana xwezayê wan xwe bi ewletir hîs dikir û wiha got: "Penîrê xwe û mastê xwe me bi xwe çêdikir. Me şîr ji pezê xwe didot û me ji hiriya wan tevn dikirin. Min jiyana li wir bi motîfên xwe anî Xezayê. 11 kur û keçeke min hene. Piştî ez ez hatim bajêr, min pezê xwe jî anî lê paşê ji ber pirsgirêkên min ên tenduristiyê em neçar man wan bifiroşin."

Jinên bi hêz afirandin

Khadra El-Sawarka ku keç û neviyên xwe jî fêrî motîfên ji hiriyê tên çêkirin dikir, bi wê re jinên serbixwe û xurt jî afirand. Dema kesên ku motîfên rengûreng dibînin matmayî dimînin, Khadra al-Sawarka bi van gotinan dawî li axaftina xwe tîne: "Min ev kar fêrî jinan kir û niha di warê aborî de pere qezenc dikin. Zarokên min ên kur jî konên mû çêdikin. Em di jiyana bajar de dahata xwe bi vî awayî bi dest dixin."

-JINHA

Rêveberiya Avê ya Qamişlo: Emê hê zêdetir bal bikşînin ser paqijiya avê

Rêveberê Rêveberiya Avê ya Kantona Qamişlo Xorşîd Oso da zanîn ku ava diçe ji welatiyan re rojane tê taqîmkirin û got, emê hewl bidin ku aveke paqij û dirust ji tevayiya tax û gundewarên Qamişlo re peyda bikin.

Darîn Silê/Qamişlo

Li bajarê Qamişlo sê stasyonên avê yên sereke hene ku avê didin bajar bi giştî, wek stasyona El Sefan, Hilêliyê û El-Ewîce. Ji bilî wê jî 12 bîrên li rojhilatê bajêr û li derdora çemê Ceqcaq jî hene. Bi hebûna van bîr û stasyonan av dighêje tax û gundewarên Qamişlo. Rêveberiya Avê ya Kantona Qamişlo jî rojane vê avê paqij û taqîm dike. Bi taybet di dema dawî de dest bi pêngaveke paqijkirin û taqîmkirina avê kirine û pêngava wan dê dewam bike.

Derbarê rewşa avê li kantona Qamişlo û paqijiya wê, herwiha pêngava paqijkirin û taqîmkirinê de rêveberê Rêveberiya Avê ya Kantona Qamişlo Xorşîd Oso ji me re axivî.

`Rojane ava xizanan tê taqîmkirin`

Xorşîd Oso da zanîn ku wan dest bi pêngaveke paqijkirina avê kirine û axaftina xwe wiha domand: "Ji berê de em avê paqij û taqîm dikin. Lê nêzî hefteyekê ye me dest bi pêngava paqijiya avê kiriye. Di pêngavê de em hê zêdetir giraniyê didin taqîmkirina avê. Rojane tevayiya xezanên avê yên ku avê didin bajarê Qamişlo bi madeya kilorê tên taqîmkirin. Ev demeke kilora av hatiye qutkirin, ji bo wê jî em klora toz li şûna wê bikar tînin. Bi vî awayî rojane ava xezanan ji aliyê pisporan ve tê kontrolkirin."

`Emê hewl bidin hin çareseriyên din ji bo paqijkirina avê bibînin`

Xorşîd got, dema av paqij be nexweşiyan bi xwe re nayne û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Ev demeke ji ber ku ava çemê firatê tê qutkirin û av li herêmên me yên din nîne, welatiyên wan herêman neçar dibin ku ava qirêj ji xwe re bikar bînin. Ji ber wê jî ev bû sedema derketina nexweşiya Kolêrayê. Lewra nexweşî ji ava qirêj û zebzeyên ku bi ava qirêj tên avdan çêdibe. Ji bo wê jî dema em li paqijiya avê ne baldarbin wê nexweşî li Qamişlo jî pir belav bibin. Wekî Rêveberiya Avê ya Kantona Qamişlo jî em rojane di milê paqijkirina avê de baldarin û emê hewl bidin hin çareseriyên din ji bo paqijkirina avê bibînin."

Xorşîd bîr xist ku gelek kesên sebzeyan diçînin, sebzeyên xwe bi ava qirêj av didin û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Pêwîste em jêdera avê ya ku sebze pê tên avdan nas bikin. Ji ber ku gelek jê sebzeyan bi ava qirêj av didin. Ji bo wê jî em bi hêvîne ku kesên sebzeyan diçînin di vî milî de baldarbin û ava paqij bikar bînin. Bi taybet di vê dema dawî de lewra nexweşî pir bûye û sedema wê ya sereke jî nepaqijî ye. Ji bo wê jî dema ku welatî jî sebzeyan ji firoşgehê bikrin pêwîste baş bişon û piştre ji bo xwarinê bikar bînin."

Xorşîd Oso got, hin caran dema ku boriyên avê dişkên gemar derbasî wan boriyan dibe û wiha pê de çû: Ev şikandin dibe sedema ku aveke qirêj yan jî axeke sor di nav avê de bê dîtin. Ji bo wê jî dema ku welatî ava xwe ne zelal bibînin, bila di cih de berê xwe bidin Rêveberiya Avê. Da em rewşê pişopînin û çareser bikin.

`Em zehmetiyê di peydekirina alavan de dibînin`

Xorşîd behsa zehmetiyên ku bi

wan re derbas dibin kir û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Ji ber ku gelek çaran ambargo li ser me tê kirin, em astengiyan di milê peydekirina alavan de dibînin. Lewra gelek caran alav û perçeyên wan ji me re pêwîstin. Lê em zehmetiyan di milê peydekirina wan de dibînin. Ji bo wê jî ev ambargoya ku li ser me tê kirin nahêle em karê xwe bi awayekî dirust bikin. Piraniya alavên me kevnin û pêwîstiya wan bi çeksazkirinê heye. Lê ji ber rewşa heyî em nikarin ti guhertinê di milê alavan de çêkin. Ji bilî wê jî em zehmetiyan di peydekirina kilora av de dibbînin."

Rêveberê Rêveberiya Avê ya kantona Qamişlo Xorşîd Oso di dawiya axaftina xwe de got, emê hê zêdetir balê bikşînin ser paqijiya avê, herwiha emê hewl bidin ku aveke paqij û dirust ji tevayiya taxên Qamişlo û gundewarên wê re peyda bikin.

Rêveberiya Sotemeniyê ya Qamişlo belavkirina mazotê berdewam dike

Rojbîn Zagroz/Qamişlo

Hevseroka Rêveberiya Sotemeniyê ya kantona Qamişlo Firyal Ibrahîm da zanîn ku rêjeya belavkirina mazotê heta niha gihîştiye 50% û got, emê belavkirina mazotê li ser şêniyên bajarê Qamişlo û gundewarên wê dewam bikin.

Rêveberiya Sotemeniyê li bajarê Qamişlo, destpêka heyva Tebaxê dest bi belavkirina mazota demsala zivistanê li ser malbatên bajêr kir. Heta niha belavkirin berdewam e û dê di heyva bê de bi dawî bibe. Da ku beriya serma zivistanê dest pê bike tevayiya malbatan mazota xwe bidest xistibin.

Derbarê awayê belavkirina mazotê li ser malbtan hevseroka Rêveberiya Sotemeniyê ya Kantona Qamoişlo Firyal Ibrahîm diyar kir ku wan îsal zû dest bi belavkirina

mazotê kir û got, rewşa belavkirina ya îsal ji ya sala borî baştir e.

Belavkirina 5 milyon litre mazot li malbatan

Firyal Ibrahîm da zanîn ku rojane mazot li malbatan tê belavkirin û axaftina xwe wiha domand: "Jimara malbatên kantona Qamişlo nêzî 65 hezarî ye. Jixwe 41 hezar malbat navê wan di lîsteya belavkirinê de heye. Heta niha mazot li 17 hezar malbat hatiye belavkirin. Herwiha heta niha 5 milyon litre mazot li malbatan hatiye belavkirin û hê jî belavkirin berdewame. Rojê nêzî 320 hezar litre tê brelavkirin."

Firyal ji bo malbatên ku navê wan di lîsteyê de neqeydkirî ne wiha got: "Nêzî 24 hezar malbat hene navê wan neqeydkirî ne. Niha em li ser vê yekê kar dikin û emê navê wan di lîsteya belavkirina mazotê de qeyd bikin. Dema em qeydkirina navan bi dawî bikin emê mazotê li wan jî belav bikin."

`Ji bo her malbatakê 300 litre mazot tê dayîn`

Firyal Ibrahîm diyar kir ku heta niha belavkirin bi awayekî dirust tê belavkirin û ti astengî û zehmetî derneketine holê. Herwiha got, me mazot li gelek tax û gundewarên Qamişlo belav kirin. Wek gundê Hîmo, Til Faris, Navkurê, Til Şeîr, Cirnik, Tenûriyê û gundên derdorê, taxa Hilêliyê, Erbewiyê, Enteriyê, Qedûrbêk, Cûdî û niha li Kornîş î hê belavkirin dewam dike. taxên ku mazot lê nehatiye belavkirin taxa Xerbî, Aşûriyê, wista û beşek ji Kornîşê jî maye. Her malbatê 300 litre mazot dighêjê. Her litrek mazot jî bi 150 Lîreyê ye.

Sedema kêmbûna rêjeya mazotê

Feryal got, Sala borî her malbatekê para wê 400 lître mazot bû, Lê îsal ji ber ku xwaringeh, dikan, kargeh û erebeyên mazotê û jenerator zêdetir bûne, ji bo her malbatê 300 lître mazot hat dayîn. Lê ne zêdebûna kargeh û erebeyan tenê, dorpêça li ser herêmê ya ji aliyê dagirkeriya Tirkî û hikûmeta Şamê ve jî bû sedema ku rêjeya nazotê kêmtir bibe. Lewra dix-

wazin pêşketin û geşepêdanê li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê rawestînin.

Derbarê kalîteya mazota îsal de jî Firyal wiha got: "Qalîteya mazota ku ji bo germkirinê tê dabeşkirin li gorî sala borî ne xirab e û eger miqdareke din ji mazotê bighêje me, emê careke din li ser malbatan belav bikin."

Hevseroka Rêveberiya sotemeniyê ya Kantona Qamişlo Firyal Ibrahîm di dawiya axaftina xwe de got, Em li gorî derfetên heyî, xizmeta gel bikin û em ê xebatên xwe yên ji bo xizmeta civakê dewam bikin.

Di çalakiyên gerîlayan de 8 leşkerên Tirk hatin cezakirin

HPG'ê ragehand ku di çalakiyên gerîlayên azadiyê yên Kurdistanê de 8 leşkerên Tirk ên dagirker hatin cezakirin û got, ji ber ku dagirkeran li hemberî gerîla bêçare mane, 16 caran bi bombeyên qedexekirî û çekên kîmyewî êriş kirin.

Navenda Nûçeyan/ Qamişlo

Hêzên Parastina Gel HPG'ê bi daxuyaniyekê ragehand ku di çalakiyên gerîlayan de 8 dagirker hatine cezakirin û konekî leşkerî hate îmha kirin.

HPG'ê di daxyuniya xwe de diyar kir ku gerîla bûye hêvî ji gelên bindest re û wiha got: "Ji ber ku gerîla gihîştiye wê astê ku artêşa Tirk a dagirker têk bibe û alternatîfa sîstema dewletên hegemon pêşkêş kiriye, tirsê berdide nava dilê van dewletan. Ji ber vê yekê bi her awayî piştgiriya teknîkî didin dewleta Tirk a dagirker, bikaranîna çekên kîmyewî û bombeyên di asta navneteweyî de qedexekirî ne, ku ji aliyê artêşa Tirk ve têne bikaranîn, ji nedîtî ve tên. Gerîlayên Azadiyê yên kurdsitanê ku bi wêrekî û fedakariyeke bilind li ber her cûre êrîşan radibin, berdêlan bide jî wê heta dawiyê dest ji vê berxwedanê bernedin."

HPG'ê da zanîn ku bi bicihanîna gerîlatiya modernîteya demokratîk û hunera lêdanê ya xurt, çalakiyên wan yên ku derbê li dagirkeran dixin wê her dewam bikin.

HPG'ê derbarê çalakiyên gerîlayan de wiha got: "Di çalakiyên hêzên me de 8 leşkerên Tirk ên dagirker hatin cezakirin, koneke leşkerî hate îmhakirin. Artêşa Tirk a dagirker Qadên Berxwedanê 16 caran bi bombeyên qedexekirî û çekên kîmyewî, 3 caran bi balafirên şer, 40 caran bi helîkopterên êrîşê û bi dehan caran jî bi obus, hawan û tankan bombe kir."

Weqfa Jina Azad: Xwebirêxistinkirin û berxwedan ji her tiştî girîngtir e

Navenda Nûçeyan-Qamişlo

Komîteya Perwerdeyê ya Wqafa Jina Azad li Sûriyê bi daxuyaniyekê ragehand ku ji bo danasîna Şerê Gelê Şoreşgerî wan dest bi kampanya serdana mal û taxan kiriye û wiha got, Ji bo civak xwe biparêze, divê li ser esasê Şerê Gelê Şoreşgerî tevbigere.

Komîteya Perwerdeyê ya Wqafa Jina Azad li Sûriyê, ji bo destpêkirina danasîna têgeha

Şerê Gelê Şoreşgerî bi gele re daxuyaniyek da.

Daxuyanî li ber navenda Weqfê ya bajarê Qamişloyê ji aliyê Nebîla Hemî ve bi zimanê Erebî hate xwendin.

Komîteya Perwerdeyê ya Wqafa Jina Azad li Sûriyê di daxuyaniyê de diyar kir ku ji bo rêxistina gel û têghiştina wan ji aliyê şerê şoreşgerî ve, wan weke Komîteya Perwerdeyê ya Weqa Jina Azad Li Sûriyê, dest bi kampanya serdana mal û taxan kir û wiha got: " Gelên berxwedêr bi taybet gelê Kurd, li ser çawaniya parastina xwe dIVê nîqaşan bike, ji ber ku ew dixwazin qanûnên parastinê bi awayekî herî baş li ser axa civaka xwe pêk bînin."

Di daxuyaniyê de hate destnîşankirin ku divê gel bi giraniya qonaxa ku herêm tê re derbas dibe zanibin.

Herwiha di daxuyaniyê de bang li gelan hat kirin ku, ji bo jiyaneke azad û bi rûmet divê xwe biparêzin û wiha got: "Li hember rastiya Dewleta Navnetewyî ye ku li ser komkujî û qirkirina gel hatiye avakirin, parastin û berxwedan ji her tiştî girîgtir û pêwîste."

Di daxuyaniyê de parastina cewherî weke rêbaza hebûna şaristaniya demokratîk hate pênasekirin û wiha hate gotin: "Şerên ku li dijî civak û gelan ya beriya 5 hezar salan ve dihat meşandin, weke kuştin, îstîsmar û hwd. Eta niha berdewam me. Lewera divê gelê me bi berxwedana xwe ji wan re bibe bersiv."

Di dawiya daxuyaniyê de wiha hate gotin: "Ji bo civak xwe ji van hemû şeran biparêze û bigihêje azadiya xwe, divê li ser esasê şerê gel ê şoreşgerî weke pêwîstiyeke lezgîn ya parastina hemû mirovahiyê tevbigere."

Piştî qetilkirina Jîna Emînî 18 rojnamevan hatin binçav kirin

Navenda Nûçeyan / Qamişlo

Komîteya Parastina Rojnamevanên Navendî ya DYA'yê (CPJ) ragihandin ku li Îranê piştî qetilkirina Jîna Emînî û şûn ve, 18 rojnamevan ji aliyê rejîmê ve hatin binçavkirin.

Komîteya Parastina Rojnamevanên navendî ya DYA'yê (CPJ) daxuyaniyek nivîskî da û diyar kir ku

ji destpêka çalakiyên protestoyî û vir ve 18 rojnamevan hatin destgîrkirin.

CPJ'ê anî ziman ku gelek rojnamevan bi serdegirtinên malan ên êvarê de, bêyî fermana girtinê yan jî der barê sûcdarkirinan de daxuyaniyek bê dayîn, hatin destgîrkirin.

Çalakiyên protestoyê, di 16'ê Îlonê de bi qetilkirina Jîna Emînî li Tehranê ji aliyê polîsên exlaq ve, re destpê kir.

Heta niha parêzvanê mafên mirovan Huseyîn Ronahî jî di nav de, bi hezaran kes hatin destgîrkirin. Rêxistina Rojnamevanên Sînoran Nas Nakin (RSF) bertek nîşanî hedefgirtina rojnamevanan, astengkirina peywendiyan a bi medyayên dîjîtal ên weke Instagram û WhatsApp'ê da û got: "Rayedarên Îranê peyamek vekirî didin: Divê têkildarî protestoyan tu agahî neyê parvekirin."

Li gorî daxuyaniya fermî di xwepêşandanên protestoyê de herî kêm 41 kes hatine kuştin, zêdeyî hezar û 200 kes hatin destgîrkirin. Lê çavkaniyên muxalif diyar kirin ku zêdeyî 8 hezar kes hatine destgîrkirin û zêdeyî 180 kes jî hatine kuştin.

’Emê bi rihê Şerê Gelê Şoreşgerî serkeftinê bidest bixin’

Koçberên Efrînê li herêma Şehbayê diyar kirin ku ewê bi rihê Şerê Gelê Şoreşgerî li ber xwe bidin û serkeftinê bidest bixin. Herwiha dan zanîn ku di her êrişekê de ewê li rex şervanên xwe bin û cihê xwe di çeperên şer de bigrin.

Zana Roj/ Şehba

Piştî ku dewleta tirkî ya dagirker êrişî kantona Efrînê kir û di 18`ê Adara 2018`an dagîr kir, şêniyên Efrînê neçar man ji malên xwe derkevin û li Şehbayê bi cih bibin. Tevî êriş û dorpêçê jî, şêniyên Efrînê li Şehba berxwedana xwe didomînin, bi sekin û îradeya xwe asta berxwedanê roj bi roj bilintir dikin. Kîn û nefreta wan ya li hemberî dijmin jî zêdetir dibe, li ser bingeha Şerê Gelê Şoreşgerî

û felsefeya Rêber Apo xebata xwe dimeşînin, ji zarokê 7 salî heta kal û pîrên 70 salî li rex şervanên xwe disekinin û ji bo têkoşîna li dijî dagîrkeriyê xwe amade dikin.

Welatiyê Efrînê ku ev 5 salin koçberî herêma Şehbayê bûne diyar kirin ewê li ser esasê Şerê gelê Şoreşgerî xwe bi rêxistin bikin û herdem li rex şervanên xwe bin, herwiha dan zanîn ku ew her dem ji berxwedanê re amadene.

’Tevayiay gel ji bo parastina axa xwe amadeye’

Welatiya bi navê Edulê Mûsa balkişand ser hevgirtina di navbera pêkhateyên ku di hundir Şehbade de jiyan dikin û wiha domand: “Ya balkêş ewe ku em sekin û helwesteke yekgirtî di navbera tevahî pêkhateyên ku di Şehba de jiyan dikin, bibînin. Ev tê wateya ku tevahî gel fikir û îdeolojiya Rêber Abdullah Ocalan naskirine û weke ryeke sereke ya azadiyê hilbijartine, hebûn û yekgirtina me li vir li ser bingeha pêkanîna Şerê Gelê Şoreşgerî ye, êdî gel ketiye wê ferqê ku divê em tevahî weke şervanên doza azadiyê û parastina axa xwe tev bigerin.”

welatiyê bi navê Reşîd Ehmed jî balkişand ser girîngiya pêkanîna Şerê Gelê Şoreşgerî û wiha got: “Di şoreşê de divê em tenê weke temaşevan nemînin, ji bo em bikaribin vê şoreşê biparêzin divê gel weke ciyayekî ku nayê hilweşandin li pişta şervanên xwe be, girînge ku em weke gelekî şoreşger tevbigerin, hebûn û tekoşîna me li vir ne ji rêzê ye, em ji bo parastina axa xwe her wiha ji bo piştgiriya hêzên xwe yên leşkerî rojane asta berxwedanê bilindtir dikin.”

Reşîd da xuyakirin ku divê her kesê ku li wir dijî xwe bibîne şoreşger û

axaftina xwe wiha qedand: “Cotkar beriya ku cotkar be divê şoreşger

be, mamoste beriya ku mamoste be divê şoreşger be, rewşenbîr beriya her tiştî divê şoreşger be, ev tê wateya Şerê Gelê Şoreşgerî û ancax em wisa bikaribin nifşên li ser esasê Şerê Gelê Şoreşgerî bidin mezimkirin.”

WelatiyA bi navê Ayşe Qebelenî diyar kir ku bi rihê Şerê Gelê Şoreşgerî wê hemû pilanên dagirkeriyê têk biçin û wiha dirêjî da axftina xwe: “Tevahî gelê ku li vir jiyan dike weke şervanekî/ê kar û xebatê xwe dide meşandin, li hember êrîş û topbaranên ku rojane di ser me de tên, îrade û berxwedana ku li ser esasê Şerê Gelê Şoreşgerî dibe sîleha yekemîn a têkbirina armancên dagirkeriyê.”

Moskovian: Divê partiyên Ermenistanê li dijî hikumeta Paşînyan a xayîn bisekinin

Lêkolînerê Ermen Hamo Moskovian diyar kir ku radestkirina 2 gerîlayan bi destê hikumeta Paşînyan ji dewleta Tirk a dagirker re, li têkoşîna gelên Kurd û Ermen xiyaneteke mezin e. Her wiha destnîşan kir ku Paşînyan û hikumeta wî hewl didin fitneyê di navbera her du gelan de derxin. Moskovian bang li partî û tevgerên Ermenan kir ku li hember hikumeta Paşînyan bisekinin.

Hevserokatiya Komîteya Rêveber a Koma Civakên Kurdistanê (KCK) hikumeta Nîkol Paşînyan şermezar kir ku desthilata Ermenistanê gerîla Atîla Çiçek (Leheng) û Hisên Yildirim (Elîşêr) radestî dagirkeriya Tirk kirin piştî ku di Mijdara 2021`an de girtin.

KCK`ê diyar kir ku ev kiryar hevkariyeke veşartî ya hikumeta Paşînyan a bi dewleta Tirk a dagirker re ye.

KCK`ê bang li gelê Ermen ku li hember vê hikumeta bi dagirkeriya Tirk re hevkar e, serî hildin. Her wiha destnîşan kir ku ew di wê baweriyê de ne ku gelê Ermen dê helwesta pêwîst li hember vê hikumetê nîşan bide.

DIYARÎ JI JI BO ERDOGAN Û XIYANETEKE MEZIN

Girêdayî mijarê lêkolînerê siyasî yê Ermen Hamo Moskovian ji ajansa me re têkildarî niyeta hikumeta Ermenistanê ji vê yekê kir û got: “Paşînyan xwest bi vê

kiryarê diyarî bide Erdogan beriya ku li Pragê di 6`ê Cotemehê de bicivin. Ev yek bi navbeynkariya serokê Azerbaycanê Îlham Aliyev û wezîrê karên derve yê Amerîkayê Anthony Blinken e.”

Moskovian wiha domand: “Di çarçoveyê wê hevdîtinê de ji demekê ve peyamên nerm di navbera Erdogan û Paşînyan de hene.”

Moskovian, kiryara Paşînyan bi xiyaneteke mezin li dijî gelê Ermen bi nav kir û got ev qet di dîroka gelê Ermen de pêk nehatiye.

Moskovian bang li partiyên Ermenan kir ku li hember vê “hikumeta xayîn” bisekinin ku di 2 salan de derdora 13 hezar kilometer çargoşe erdê Qerebaxê radest kir. Her wiha amadekariyan dike ku di çend rojên bê de 7 hezar kîlometreyên din radestî Azerbaycanê bike.

HEWLDANÊN DERXISTINA FITNEYÊ

Di daxuyaniya KCK`ê de hate gotin: “Tevgera Rizgariya Kurdistanê ne tenê ji bo gelê Kurd lê belê ji bo hemû gelên herêmê bi taybet gelê Ermen tê dikoşe. Gelê Kurd, gelê Ermen xwe bira dibîne. Welatê ku tê de dijî, welatekî hevbeş dibîne. Bê vê hestê nêzî gelê Ermen dibe û piştgiriya doza wî dike. Gelên Ermen û Kurd hev du baş nas dikin û bi hestên erênî nêzî hev dibin.”

Der barê mijarê de Moskovian got: “Paşînyan û rayedarên wî li Azerbeycan û Tirkiyê, hêzên paşverû li Ermenistanê, hewl didin fîtneyê di navbera gelên Ermen û Kurd de derxin. Piştî ku têkiliyên di navbera her du gelan de bi pêş ketin, bi rêya paşguhkirina rûpelên reş ên dîroka her du gelan. Lê ne Paşînyan û ne jî yên din, dê nekarin di van hewldanên derxistina fitneyê de bi ser bikevin.”-***ANHA***

JIN JIYANA AZADÎ, JI ROJAVA BER BI ROJHILAT VE

DILYAR CIZÎRÎ

Piştî bûyera şehîdxistina jina kurd a ciwan Jîna Emînî ya ji Rojhilat, gel bi diruşmeya “Jin Jiyane, Azadî” destê bi xwepêşandan kir. Ev ev çend roj in dewam dikin û pê re jî li nava bajarên Îranê belav dibin. Dema mirov behsa vê serhildana gel di rewşa rêjîmeke wekî va Îranê dike, bê guman tê zanîn ev hêrsa gel ne tiştekî jî rêzê û tesadîfe.

Teqîneke di encama kombûyîn û zordariya dehên salan e hikûmet li ser gelê kurd bi taybet û Îranê bi giştî dimeşîne ye. Beriya niha jî rewş li Rojhilat û Îranê dihat vê astê. Lê piştî çend rojan bêyî aliyekî siyasî û rêxistinek pêşengtiyê bike bê deng dikirin.

Lê heger em bala xwe bidin diruşmeya hevbeş a xwepêşandên Rojhilat û Îranê “Jin, Jiyane, Azadî” ye, ev sernavê di Şoreşa Rojava ya bi pêşengtiya gelê Kurd hate meşandin tê bîra mirov. Şoreşa Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi saya piratîzeekirina vê diruşmeyê bi ser ket û bala hemû cîhanê kişand ser xwe. Jinên Kurd di hemû qadan de pêşengtî kirin û di hemû aliyên jiyanê de li kêleka pêkhateyên din karîbûn bingeha vê diruşmeyê deynin.

Ew jî bû hêmanekî bingehîn îro Rêveberiya Xweser di cîhanê de deng vedaye û hema bêje tu kes di cîhanê de nemaye gavên li vî parçeyê Kurdistanê ne bihîstiye.

Armanca min ji bîranîna gavên li Rojava hatine avêtin, ew Kurdên Rojhilat ji ezmûna Rojava sûdê werbigirin. Em gotina pêsiya ya “Mirov ji kîsî xwe fêr dibe” bîbîr bixin. Niha serhildan li parçeyekî din ê Kurdistanê ye. Diruşme yeke û tirajîdiya pir nêzî ya Rojava ye.

Ji ber wê dî serî de ji gelê kurd ê Rojhilat tê xwestin û bi taybet tevgera siyasî ya Rojhilat bi hemû partî û rêxistinên xwe. Li gorî gavên li Rojava hatine avêtin pêk bînin. Riya çareseriyê Netewa Demokratîk û jiyana hevbeş e. Ji xwe Rojhilatê Kurdistan û Îranê cihekî bi pirengiya tê naskirin. Pêwiste ev pirengî bibe hêmanê bingehîn ê hêza şoreşê. Divê di zûtirîn dem de li Rojhilatê Kurdistan û Îranê cebheyeke demokratîk were avakirin. Heger cebheyek demokratîk a hevgirtî neyê avakirin, metirsîneke mezin heye destên derve dirêjî nava xwepêşandan bibe. Ev jî wê bibe sedema rewşa li Rojhilat û Îranê ber alozîyeke hîn mestir ve biçe. Di heman demê de wê rê li ber komkujiyên mezin ve biçe. Ji bo avakirina cebheyeke wiha ji nivskar, siyasetmedar û rewşenbîrên li Rojhilat û Îranê û di serî de jin tê xwestin pêşengtiyê bikin.

Di heman demê de ji her kesî zêdetir barê pêkanîna vê eniyê û pêşengtiya vê demê ji sedan ciwanên ji Rojhilatê Kurdistanê ji bo piştgiriya şoreşa Rojava hatin herêmê. Ji sala 2014’an ve hin ji wan li vir in ezmûna Rêveberiya Xweser jiyan kirine û hemû detayên wê nas kirine.

Ew dikarin rolekî mezin bilîzin û rê li ber alîgirên derve bigirin. Di heman demê de ji ciwanên hemû parçeyan tê xwestin û di serî de yên Rojava piştgiriya gelê Rojhilat bikin.

’Jina Kurd li Rojhilatê Kurdistanê bû çirûska şoreşê’

Berdevka Yekîtiya Jinên Ermen yên bakur û rojhilatê Sûriyê diyar kir ku jina Kurd li Rojhilatê Kurdistanê mînaka jina berxwedêre û got, tevî zext û şidetê jî, jina Kurd li Rojhilatê Kurdistanê bûye pêşenga serhildanê.

Şaho Gabar / Qamişlo

Ev nêzî 11 rojin ku bi pêşengtiya jinan li her devereke ji bajarê Rojhilatê Kurdistan û Îranê, li dijî rejîma desthilatar ya zilam û zextên wê yên li ser jinên Kurd, berxwedanek bi heybet tê meşandin. Li Merîwanê di 8’ê Îlonê de, dayika du zarokan a bi navê Şilêr Resûlî, ji ber destdirêjiya zilamekî girêdayî artêşa rejîma Îranê, xwe ji qata 2’na avêt xwarê û bi vî rengî hate qetil kirin. Jinan ji bo xwedî derketina li Şilêr Resûlî, li dijî bê exlaqiya zilamê dewletê bi şêwazek serhildanê, helwesteke civaka exlaq û politîk nîşandan. Di wan çalekiyên xwe de ji neyarê jinan re, ev peyam dan: ‘Destdirêjiya li ser jin, destdirêjiya li ser civakê ye.’

Hê şîna dayika bi navê Şilêr Resûl bi dawî nebibû, keça bi navê Jîna Emînî dema ku bi birayê xwe re, ji Saqizê çûbû bajarê Tehranê. Li wê derê ji ber cil û bergê (Hîcab) Jîna Emînî ji milê polîsên ku xwe wek parasvanên exlaq pênase dikin ve, di dema binçavkirinê de, di bin îşkenceyê de hate qetil kirin. Jinên Kurd, vê carê bi hêrsek dîrokî diruşmeya ‘JIN, JIYAN, AZADÎ’ ji Saqiz, Sine, Şino, Mihabat, Dîwandere, Tehran û gelek bajarên din, ji zihniyeta qirker re dibêjin: “Êdî bes e.”. Jina Kurd li dijî bêexlaqiyên rejîma Îranê, xwepêşandanên zêde kirin.

Li ser pêşengiya jina Kurd li Rojhilêatê Kurdistan û Îranê ji serhildanên gel re berdevak Yekîtiya Jinên Ermen li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Anahîd Qisêban ji me re axivî.

Anahîd diyar kir ku li Îran û Rojhilatê Kurdistanê, jin bingeha civakê ye û wiha got: “Jina Kurd li Rojhilatê Kurdistanê xwedî hêz û îradeyeke xurte, bi sedê salane ku li hemberî desthilatdariya mêr li ber xwe daye, herdem jin bûya sirûda azadaiyê. Di dîrokê de gelek jinên Kurd li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê têkoşîneke mezin dane meşandin, li hemberî faşizmê rêjîmê serî hildane û bûne sembola azadî û berxwedanê.”

’Jina Kurd ya Rojhilatê Kurdistanê jî aşiqa azadiyê ye’

Anahîd da xuyakirin ku jinên Kurd li Rojhilatê Kurdistanê navê xwe bi tîpên zêrîn di dîroka berxwdana jinê de nivîsandine û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Tevî zor û zehmetiyan jî, jina Kurd li Rojhilatê Kurdistanê teslîm nebû. Dihat girtin, işkencekirin û kuştin jî, lê serî ji sîstema desthilatdar e neditewand. Glek jin bi sêdaran ve hatin daleqandin, hin ji wan jî bi dizî hatin kuştin. Gelek jin heta niha jî di zindanê rêjîma Îranê de ne.Lê wan dest ji berxwedanê bernedan . Jina Kurd ya Rojhilat wekî jinên berçeyên din yên Kurdistanê aşiqa azadiyê ye û navê xwe di pirtûka berxwedana jinê de nivîsandiye.”

’JinA Kurd bû çiroska serhidanê’

Anahîda Qesêban bang tevayiya rêxistinên jinan yên cîhanê kir ku jinên Îranê û Rojhilatê Kurdistanê bi tenê nehêlin û axaftina xwe wiha qedand: “Jinê Çirûska serhildanan pê xist û serhildan li tevayiya Îranê belav bû. Xwepêşandanê dawî yên li Rojhilatê Kurdisatn û Îranê tekez kir ku tevî şideta li ser jinê, lê ew dikare serhildanan birêve bibe û bibe pêşenga şoreşa Azadiyê. Di dema niha de ji tevaiya jinên cihanê tê xwestin ku bi awayekî çalak tevî çalakiyan bibin û piştgiriya jinên Îranê bikin.Herwiha ji tevaiya rêxistinê jinan tê xwestin ku zextan li Neteweyên Yekbûyî bikin da ku sînor ji faşîzma rêjîma Îranê ya li dijî jinê bên dayîn û hesabê kuştina jinan jê bê xwestin”

Hêjayî gotinê ye ku Rêber Apo di name û peyamên xwe yên di derbarê çareseriya pirsgirêka jina Kurd û jinên cîhanê de, gelek nerînên dîrokî pêşkêş kirine. Di van nerînan de tekez kiriye ku têkoşîna sedsala 21’an wê bibe têkoşîna jinan. Bê guman ev heqîqet îro li Rojava û Rojhilatê Kurdistanê di pêşengiya jin û ciwanan de tê tespîtkrin. Lê helbet ne wiha ji xwe de dest pê kiriye. Têkoşîna jênê pişta xwe dide zanista jin û dîroka bîrdoziya ‘Rizgariya Jina Kurdistanê’ her wiha KJK’ê.

Divê ciwan li Şoreşê xwedî derkevin

Zekî BEDRAN

Li Sûriyê pirsgirêk giranin, qelişandin û hilweşandineke kûr heye. Ji bo pirsgirêk werin çareserkirin hêzên peywendîdar wek tê xwastin berpirsiyariyê nagirin û tevnagerin. Di rewşa heyî de herî zêde Erdoganê faşist yê dagîrker ji bo armanca xwe lez daye lêgerînên xwe. Amadekarî û lêgerînê wî, ji bo çareserkirina pirsgirêkê nîne, ji bo girankirina pirsgirêkê ye. Bi taybet dixwaze êrîşê rojava bike, hinek herêman dagir bike û koçberî û hilweşandinê zêdetir bike.

Rêjîma Şam`ê jî li bendêye ku, weke berê desthilatdariya xwe bide rûniştandin û îdare vegere weke beriya 2011’an. Lêbelê, dikare bi Rojava û herêma xweser re, bi lez pirsgirêkên xwe çareser bike û yekîtiyek ava bike.

Çi hêvî jî hêzên derve jî nayên kirin. Ji ber ku herkes ketiye dû berjewendiyên xwe. Weke tê dîtin di siyaseta wan de şêlûbûn heye, ev jî bi şikleke xwezayî civakê bandor dike. Mirov paşroja xwe di ewlehiyêde nabînin. Pirsgirêkên aborî yê cidî hene, Sûriyê di bin ambargoyeke girande ye. DAİŞ hîn jî kengê derfet bibîne xwe rêxistîn dike û êrîş dike. Çeteyên ku Tirkiyê ew li dora xwe kom kirine, qanûn û pîvan nas nakin. Gel dişelînin, talan dikin. Gûndên nêzî herêmên dagirkirî bê navber di bin êrîşande ne. Bi êrîşên asmanî re êrîşên top û teqemenî qet nesekinin e. Xebatên sîxûrkirinê bêpîvan didomin. Propaganda dijber û şerê psîkolojîk bê sînor heye. Dema xwe esas girtina rêjîma Şam`ê jî li ser ew qas pikirikan tê zêdekirin jî, rewşa gel girantir dibe.

Li ser tengasî û nezelaliyên ku me behs kirin, terikandina ciwanan ya erd û welatê xwe jî, tê rêxistinkirin û tê teşwîq kirin. Li gor agahiyên ragihandin û hinek derdoran, koçberiya ciwanên bakûr û rojhilatê Sûriyê zêde bûye. Ev yek tê wateya şer bi şêwazeke din didome. Dewleta tirkan wek dixwaze nikare êrîş bike, dagirbike lê, bi şêwazên din yên şer gel dide koçber kirin. Domandina Tehdit û êrîşên xwe ji ber vê ye. Herwiha sînoreke dirêj ya rojava û bakûrê Sûrî heye. Sînoran ji ber qaçax derbasbûnê girtin ne hesane. Dewleta tirkan ji bo rev derbasbûnan hesan dike. Yê dixwazin biçin beşek ji wan, ji herêmên kontrola rêjîmêve diçin. Ew jî derbasbûnan hesan dikin. Dema wiha bû yê direvin û diçin zêde dibin. Derketina derve barek giran ya aborî ye, bi hezaran dolar pêwîste. Kaçaxçiyên mirovan û rûşvet sîstemek şelandinê avakirine. Di vê pêvajoya hilweşandina aborî û xizaniyêde, bi hezaran dolar peydakirin ne hesan e. Yê diçin destê wan de çi hebe difroşin û gelek ji wan jî deyndar diçin. Beşek ji wan destê şebekeyan de dimînin. Yên tên xapandin û yên di holê de dimînin pir hene. Beşek ji wan jî di rêwîtiyê nê ewle û ne tendûrist de telef dibin.

Rev an jî lêgerîna jiyanek baştir, gelo li welateke xerîb kêyfxweşî bîne? Mirov di bin psîkolojiya birçîbûn û tirs de nikarin bi tendûristî bifikirin. Şûna ku Li welatê xwe, li ser erdê xwe, bi çanda xwe hilberandin hebe, çima here welateke xerîb? Ev yek divê bê lêpirsîn kirin. Feqîrtî û zehmetî dibe ku hebin, berê jî herkes jîyana burjuwazî jîyan nedikir. Lê mirov bi erdê xwe û çanda xwe ve girêdayî bûn. Yên ku ji axa xwe qût bibin, ji rih ê xwe qût bibin, wê belav bibin. Di nava çandên din û civakên din de wê bihelin, asimile bibin. Ev xeterek mezin e. Ger wiha nebûya dijmin û hêzên desthilatdar gel ew qas teşwîqî koçberî nedikirin. Mirov nikarin tenê di lêgerîna maddiyat û jîyana hesan de bin. Ji bo mirovan çand, welat, ax jî pêwîste. Ger welatê xwe biparêzî, hilberînê bikî, xwe rêxistîn bike, bi xwezayî wê rewşa jîyana te baştir be. Kes birçî, feqir û bê kar namîne. Ev yek ji Welatên pêşketî û dewlemend re, ji esîmanan daneketi ye Ji ber vê yekê bi taybet ciwanên rojava û Sûrî divê welatê xwe neterikînin. Malbat şûna ku cûwanên xwe bişinin derve, divê dijber derkevin. Ger bi navê girêdana axê, welatparêzî tiştek mabe, divê kes neçe û xwedî li nirxên xwederkevin. Gelên bê ax û bê welat nikarin xwe bigihînin paşrojê.

Saziyên Rêveberiya Xweser û ragihandina azad di van mijarande divê konseptên berfireh pêşbixin û tevbigerin. Ji aliyeke ronahîkirin û perwerdekirin, aliyek din jî li cûwanan xwedî derketin û tevlî kar kirin. Ji gûndan heta bajaran di hemû qadan de kampanyayek rêxistinkirin û xwe gihandina her kesî pêwîste. Bi taybet erkê herî mezin dikeve ser milê rêxistînên ciwanan. Xwe gihandina hemû aliyan, têkîlî pêşxistin û ev leystok vala derxistin, erkekê sereke yê şoreşgeri ye. Hemû kesên erkdar divê van xebatan weke xebateke xwe bibîne. Kes erkê xwe ji keseke din re nehêle, hawaleyê keseke din neke. Gelê ku ciwanên wê ne rêxistinkirî û hişyar be paşrojê wê nabe.

Ji bo dagirkeran her tim xwefiroşek peyda dibe

Memed Serdar

Dewleta tirka ya dagirker di hemû warên jiyanê de dûrî pîvanên mirovahî tev digere. Weke ku her tiştek pîvaneke xwe heye, şer û dijminayî ji pîvanê wê hene. Di şerde dijminê xwe xapandin û taktîkên cûrbecûr hene,

bi hezaran salin tên bikarhanîn. Lê hinek pîvanên şer hene dijminên herî xerab jî van pîvanan bin pê nakin û li gor wan pînana şerê xwe dike. Sekna dewleta dagirker ya tirkan li hemberî pîvanên şer, ji heqîqetê wan ya dîrokî tê. Ji ber ku di dîroka dewleta dagirker ya tirkan de li erdekê bicihbûn û ji pêşketinên mirovayî sûdgirtin, çênebûye. Herdem li ser pişta hespa geriyan e û dema birçî dibûn, êrîşî dora xwe kirine û talan kirine. Piştî hatine wan ya Anadolê û bakûrê Kurdistanê, nirxên weke mirovayî, medeniyet, çanda gelan, cirantî û dostanî jî ji gelên herêmê ditine, lê heta niha jî bi van nîrx û pîvanên mirovayî re nebûne yek.

Di şer de êrîşkirina li ser dijmin tişteke asayîye, lê êrîşên ser medeniyan, jin û zarokan derveyî pîvanên şer e. Herwiha dî şer de hinek çek hene bikaranîna wan di peymana mafê mirovande û NY (Netewên Yekbûyî) de hatine qedexe kirin. Lê dewleta dagirker ya tirkan bi taybet dî şerê dijî gelê Kurd de yekê ji van pîvanan jî pêk nayîne. Ne tenê şerê leşkerî, di asta şerê taybet jî hemû pîvanan binpê dike. Di serîde ji bo gelê tirk bi xapîne, sînoryoyên derew belav dike. Di dîroka şer ya dewleta dagirker ya tirkan de, çend caran bi navê MÎT ê anjî saziyeke din agahiyên weke operasyonê taybet hatibe belavkirin, ji wana agahiyan ji sedî yek jî nerastê. Mînaka herî dawî, beriya çend rojan, agahiyên li ser 2 endamên HPG`ê hat belavkirin. MÎT a tirkan weke bi operasyoneke taybet 2 endamê HPG li Ermenya hatine girtin, agahî belav kir. Piştre hat fêmkirin ku ev her dû endamên HPG ev nîzik saleke li Ermenya girtîbûn û îstîxbaratê Ermînya ew herdu gerîla teslîmê îstîxbarata tirkan kirîye. Di raya gîştî de bawerî bi agahiyên îstîxbaratê tirkan nîne, ji ber wî herkes bi gûman nîzikî vê agahiyê bû û piştre rastî jî derket.

Weke pîskolojik bê destê girtin, hêzên binketî û ji xwe nebawer wiha bi agahiyên operasyonê sexte dixwazin xwe mezin bikin. Lê piştre hîn zêdetir xwe li ber çavê hemû cîhanê rezîl dikin.

Aliyê din ya vê pirsgirêkê jî nîzîkatî û xiyaneta hikûmeta Paşînyan ya Ermînya ye. Di serîde divê bê pirsîn hêzên sînor yê Ermînya ev herdû endamê HPG çawa girtine. Daxüyaniya HPG`de mijar hatiye zelalkirin. Teslîm kirina endamên HPG ji bo tirkan, rewşa hukûmeta Paşînyan jî eşkere kir. Çend daxüyaniyên piştî teslîm kirina dû endamên HPG`ê de eşkere bû ku ev xiyaneta yekem ya Paşînyan nîne. Gelê Ermen Paşînyan baş nasdikin û di rastiyê de ev demeke dirêje ku Paşînyan xîyaneta gelê Ermen dike. Bi dijminê Ermeniyan re dostanî dikir û di gelek mijaran de li hev kiribûn.

Tê idîa kirin ku Paşînyan bi navbeynkariya Aliyev têkîlî bi MÎT`a tirkan re daniye. Herî dawî beriya çend rojan artêşa Azeriyan êrîş kirin, yê resmî hatiye ilankirin 150 leşkerê Ermenya jîyana xwe jî desî dan. Mirovek di asta herî ketîde jîyan bike jî, di rewşeke cenazeyên 150 leşkerê wî li erdê be bi qatilê leşkerê xwe re hevdîtin nake û lihev nake. Li ser vê rewşê wî endamên HPG teslîm kujerê bi milyonan gelê Ermen, kiriye. Divê bê pirskirin gelo Paşînyan xwe li hember çi firotiye tirkan. Herwiha divê gelê Ermen ê bi şeref demeke zûtir, xwe û welatê xwe ji xayînên weke Paşînyan xelas bikin.